Nawisk

Çima Vîn.Tv bi şêweyekê normal, berîkaneya xwe ya (top kilîp) bi dawî neanî?!

Tehsîn Navişkî

Mîna me temaşedikir, kenalê esmanî yê kirmancî Vîn.TV yê ku hêşta di qonaxa têstê de ye; wek kenalekê hunerî yê nexrî, li Kurdistana azadkirî, li meha remezana pîroz bi niyazeka pakij; wek diyardeyeka şaristanî berêkaneyeka ((top kilîb)) ya hunerê stirînê, li ser şaşeya xwe vedike û hijmareka hunermendên Kurdistanê tê de beşdardibin. Lê mixabin ev diyardeya şaristanî; mîna piraniya karên me yên din, bi rengekî serkeftî û normal bi dawî nehat. Anko berî encam li neqeba temaşevanên hunermendên pişikdar di berîkaneyê de, bitir nerênîbibin, kargêriya kenalê navhatî, hind gehiştin, berîkaneyê berî çaxê xwe yê biryar li ser hatî dan, bi dawî bînin û du serkeftiyan, li pey sîstemê (fîftî fiftî) destnîşan bikin û xelatê êkê yê berîkaneyê li ser parvebikin.

Helbete bi vî şêwazî, anku berîkaneya ((top kilîp)) a nexrî li ser şaşeya Vîn.T bi şêweyekê neserkeftî bi dawî hat. Wek ji axavtinên piraniya temaşevanan hember kiriyara (fiftî fiftî) xuyadibe, ew temaşevan xeyidî û nerazî ye, hember berîkane bi wî şêweyê neşaristanî bi dawî hatî. Piraniya van temaşevanan, weha didin xuyakirin, wan gelek xerciyat bi kirîna kartên mobaylan ji bo serkevtina hunermendên xwe mezaxtine... Dawiyê berhemê wê çeten û xerciyatê bi şêweyekê şaristanî nedît û berîkaneya çaverê li diwayê ahengeka hunerî ya spehî, bi beşdarabûn hemû hunermendan were kirin, bi hêsanî bi dawî hîna û ew sentên li kartan mezxtîn, piraniya wan herweyî çûn û rêz li helwêstê wan nehat girtin!

Hindî min bihîstî, wek gelek tiştan, xelkê me neteweya xwe tawanbardikir û weha dida xuyakirin, ku em wê hemû caran li dawiya pêvajoya cîhanê bin; ji ber ku rêkxistina şarstinanî di karên me de tune ye. Dibe ev

axavtinên wek rexne, di germa torebûnê de ji hevdu re dihên arestekirin; heya radeyekî rastî tê de hebe. Her di gel van rastyan, hinek peyvên din jî hene, dibe bibin sedemên sernekevtina pirojeyên ji van core pirojeyan, di Kurdistaneka bê ala û sînorên destnîşankirîn de.

Bi nêrîna min, çaxê televzyona (vîn) hizra vê berîkaneyê kirî, ez weha têdigehim, wan mijarê berîkaneyê, bi şêweyekê zanistî vekolîn li ser nekiriye, kanê dawiyê berîkane wê ber bi kîjan semtê here? Bi nêrîna min; heke li destpêkê hizra berîkaneyê, bi rêka şareza û bisporan hatiba xwandin û vekolînkirin, stiranbêjên pişikdar bi wî şêweyê cugrafîkî û eşîretkanê nehatiban helbijartin, dibe weha bandora xwe ya nerênî û eşîretgerî nebaye û bi wî şêweyê wêrankar bi dawî nehatibaye.

Ji layekê din, bila em xwe nexapînin, ev xwezayî ya derûna xelkê me ye. Me bivê nevê; hêşta hember xelkê pêşkevtî û xwedî çand û huner, em di qonaxa civakên hoz û eşîretkanê û giştûkalî de ne. Anko hêşta gelek maye; mina xelkekê din, em hizra yê din bi şêweyekê şaristanî qebûl bikin. Rast e caran em wê bi devî nêrîna yê hember qebûl bikin. Lê çaxê geha piraktîzekirinê, em rastiya derûna xwe eşkira dikin û em ji sîstemê peyvên bi devî gotin derdikevin.

Anko weha ji mere eşkira dibe, berîkaneya telivezyona vîn jî her weha bûye. Rast e bi devî stiranbêjên pişikdar û hezjêkerên wan weha dida xuyakirin: Hîç cudayek tuneye; kî di vê berîkaneya nexrî de derbikeve, helbet kurd e û wê pîrozî lê bihê kirin. Lê ya di riyalîtî de hatiye piraktîzekirin, rastiya wê berovaj bûye û axavtinên xweş û şaristanî, berî berîkane bi dawî bihêt bûne zendikhelkirin û buksanê û qade bo dijwariyê û nexweşiyê berfireh bû! Anko her wekî berîkaneyeka cîhanî ya çerxên kevin hatiye kirin û serkeftin keftiye ser rêjeya hêza mil û baskên temaşevanan û layenên din yên pişikdar divê pirosê de.

Li vir dibe nêrîna min bo vê diyardeyê nêrîneka ji ya xelkekê din cudabe yê ku bi şêweyekê mijdar û demargîrî mêzey kêşê dikin. Anko ez weha dibînim, ev bûyereke normal e di riyalîtê me yê îro de diqewme. Çunkî hêşta civakê me yê kurdî; mîna li serî me amaje dayî; mîna piraniya civakên din yên rojhelat; hêşta di qonaxa eşîretgeriyê û giştûkalî daye. Ez bawer dikim, em wê gelek dîmenên ji vî terzî û dibe kembaxtir bibînin; heya em bikarin bi şemendefira (tirêna) şaristanî ya cîhanî re bigehin. Lê tiştê giring bi nêrîna min ew e, em bikarin hemû caran mifayî ji şaşiyên xwe yên dîrokî bibînin. Heker mifa ji şaşiyên me nehê dîtin, anko em her wê bimînin xwediyên xwe û çarekirina kêşeyên xwe yên şaristanî, bi rêkên tund û dijwaryê û rêkên din yên neşaristanî.